

Gihîştina xwendekaran ji bo NSW EduChat

Agahî ji bo dê û bav û çavdêrsn

NSW EduChat amûrek e zekayê zanistî (artificial intelligence) ye ku ji hêla Wezareta Perwerdê ya NSW (NSW Department of Education) ve hatiye çêkirin û xwediyê wê ne. Ew hatiye çêkirin da ku ewle, perwerdekar, parastî û taybet be.

Gihîştina xwendekaran ji bo NSW EduChat

Xwendekarên ji sala 5 heta saka 12 êdî dê bikaribin dest bi (NSW EduChat) dikin di Tirma 4, 2025 de.

Ewlehiya ji bo xwendekarên NSW EduChat bikar bînin

Daneyên NSW EduChat ewle ne. Hemû dane li hundirê wezaretê de dimînin. Ev tê wate ye ku xwendekar dikarin bi ewlehî karê xwe û agahiyên xwe yên taybet binivîsin di hundirê NSW EduChat de.

Şeweyê perwerdekariya NSW EduChatê

NSW EduChat ne tnê bersivên temam dide pirsan. Ew ji xwendekaran re pirsên vekirî dipirse. Ev alîkariyê dike ku xwendekar bêtir fikir û ramanên xwe parve bikin. NSW EduChat tenê nivîsê bikar tîne – wêneyan, vîdyoyan an muzîk çênake.

Bikaranîna NSW EduChat ji bo alîkariya spartek û ezmûnan

Ger dibistan bibêjin ku NSW EduChat dikare ji bo spartek û ezmûnan were bikar anîn, xwendekar divê mamosteyên xwe agahdar bikin. Ev di nav de, wekî bi NSW EduChat re nîşe kirin, peyva serekeyî şîrove kirin, an nivîsê rêzê kirin. Dibistan divê rêya agahdarkirina mamosteyan di demek guncaw de ji xwendekaran diyar bikin.

Gihîştina NSW EduChatê di malê de

Xwendekar dikarin li mal xwebîhînin NSW EduChat bi rêya:

- Di dergeha xwendekaran de: <https://portal.education.nsw.gov.au/>
- Bi dirustî bi rêya: chat.education.nsw.gov.au

Xwendekar divê bi hesabê xwe yê NSW Department of Education têkevin. Tenê xwendekarê ku têkeve dikare NSW EduChat bikar bîne.

Ger hun dixwazin li ser vê amûrê biaxivin, bi midûrv re têkilî daynin.



Ji bo agahdariya bêtir û gihîştina NSW EduChat parental privacy notice (Agahdarkirina dê û bava ya nehîtiya NSW EduChat) seredana vê bikin: [Student use of NSW EduChat](#)

Xizmeta wergêriyê li see telîfonp (TIS): 131 450

Ger pêdiviya we bi alîkariya wergêran heye, telîfonî (TIS) bikim û bêjin kîjan zimanî hun dixwazin û hejmarê ku dixwazin bigihêjin. Opêrator de wergêrekî li ser xatê peyda bike ji bo alîkariya we bike. Ev xizmet belaş e.